EZ Û XUDANA MIŞOTÊ

Hemdî Remezan Eredinî

Were xudana mişotê…..mişota xwe dane… da ez û tu mita bi mita biguhorin… şekir bi qumaş… benîşt bi genim….. da ez û tu danûstandinan bikin...çavzilkanê bikin… hêşta hosta bi me re negehiştî!!! hêşta hêştir bi bar ve di kuna derzîkê ra ne çûyî… were mişota xwe dane, serê xwe bi singê min ve ne da te hembêz bikim… da te ji deqa rizgar bikim.. were lezê bike xwe gîro neke… dimdimê Xanê Lebzêrîn avakirî dê herife.. kuncek û qap û qur namînin… were bêhna bayê şevên biharan bi helmirêsin… li govenda xwe bilezînin… lavije û stirana bêjin… li Amedê, li Qamişlo li Kerkûkê û li Mihabadê xwe pelavêjin… sernişîv, serevraz destên xwe têkda bigirin bidine hev nehêlin careka dî li me bibe şev, li me bibe rev.!!!